# Bultena heftane

# 10/6/2023

Email: **starmalper13@gmail.com**

Facebook:kongra star-مؤتمر ستار

Youtube: kongra.star22@gmail.com

**Nûçeyên ji cîhanê**

## [Li Elmanyayê ji sêyan yekê mêran şîdeta li ser jinê qebûl dikin](https://anfkurdi.com/jin/li-elmanyaye-ji-seyan-yeke-meran-sideta-li-ser-jine-qebul-dikin-170723)

Li gorî lêkolîneke ku li Elmanyayê hatî kirin, ji sêyan yekê mêr şîdeta li ser jinê qebûl dikin. Aktîvîstên mafên mirovan ji ber vê yekê matmayî bûne.

https://anfkurdi.com/jin/li-elmanyaye-ji-seyan-yeke-meran-sideta-li-ser-jine-qebul-dikin-170723

Çavkanî: ANF



## Li Elmanyayê asayîkirina tundiya li dijî jinan di lêkolînan de xuya bû

Li gorî lêkolîneke ku li Elmanyayê hat kirin, ji sedî 34'ê mêran li xwe mikur hatin ku tundiyê li dijî jinê pêk anîne. Li gorî daneyên Polîsên Federal ên Elman di sala 2021'an de zêdeyî 115 hezar jin di nava malbatê de bûne mexdûrê şîdetê.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-elmanyaye-asayikirina-tundiya-li-diji-jinan-di-lekolinan-de-xuya-bu-39438

Çavkanî:JINHA



# NY: Pêşdarazên zayendperest ên civakî berdewam in

Bernameya Bipêşveçûnê ya Neteweyên Yekbûyî, diyar kir ku tevî kampanyayên kûreyî û xwecihî ku ji bo mafên jinan tên kirin, pêşdaraz berdewam in.

https://anfkurdi.com/jin/ny-pesdarazen-zayendperest-en-civaki-berdewam-in-170764

Çavkanî: ANF



## Rojhilata navîn

# Dîplomeya xwe diyariyê xwendekarên hatine qetilkirin kir

ÎZMÎR - Endama Koordînasyona Navenda Pîrebokên Kampusê Berfîn Buyukertaş ku di Merasîma Zanîngeha Demokrasiyê ya Îzmîrê derket ser dîkê, dîplomeya xwe girt û dovîza li ser 'Di serî de ji bo Gulîstan Doku û xwişkên xwe yên zanîngehê yên hatine qetilkirin digirim' nivîsandî vekir.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/212616

Çavkanî:JINNEWS



# Têkoşera azadiya jinên Mexrîbî Rahma Nazîf hat bibîr anîn

Pêşenga xebatên sendîkal, siyasî û mafên mirovan a Mexrîbî Rahma Nazîf ya bi xebatên xwe mîrateya têkoşînê ya giranbûha ji jinan re hişt di çileya wê de hat bibîr anîn.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/tekosera-azadiya-jinen-mexribi-rahma-nazif-hat-bibir-anin-39410

Çavkanî:JINHA



# Penaberen jin ên Sûdanî rastî cihêkariyê tên

Penaberên jin ên Sûdanî yên ji ber şer neçar man welat biterikînin di şert û mercên zehmet de dijîn. Jinên Sûdanî yên koçî Qahireyê bûne rastî cihêkariyê tên.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/penaberen-jin-en-sudani-rasti-cihekariye-ten-39419

Çavkanî:JINHA



# Tûndiya mêr zêde dibe: Polîtîkayên pêşîlêgirtinê nîne

Li herêma Kurdistanê her çendî li dijî kuştin û tundiya li ser jinan zagon hene jî, ji ber zagon tenê di nivîsê de dimînin û polîtîkayek pêşîlêgirtinê ya hikumeta heremê nîne tundî û qetilkirinên jinan zêde dibe.

https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/tundiya-mer-zede-dibe-politikayen-pesilegirtine-nine-39421

Çavkanî:JINHA



## Li Perûyê 3 hezar û 400 jin winda bûn

Ji ber sedemên ku nayên zanîn salane bi sedan keçên ciwan û jin ji ber negirtina tedbîran winda dibin li Perûyê û aqubeta wan nayê zanîn.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-peruye-3-hezar-u-400-jin-winda-bun-39426

Çavkanî:JINHA




## 3 mehên li Misirê: Herî kêm 51 qetilkirina jinan û mirinên bi guman

Li gorî daneyên United Nations Office on Drugs and Crime û UN Women, li Misirê di 3 mehên destpêke yên sala 2023’an de 51 jin hatine qetilkirin ango bi guman jiyana xwe ji dest dane.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/3-mehen-li-misire-heri-kem-51-qetilkirina-jinan-u-mirinen-bi-guman-39435

Çavkanî:JINHA



## [Kifah Al-Ghussein bi helbestên xwe balê dikşîne ser jinên Filistînî](https://jinhaagency1.com/ku/cand-u-huner/kifah-al-ghussein-bi-helbesten-xwe-bale-diksine-ser-jinen-filistini-39439)

Kifah Al-Ghussein a ku di zaroktiya xwe de nîvîs ji xwe re kiriye şêwazek jiyanê, di helbest û nîvîsên xwe de behsa Fîlîstîn û jinan dike.

https://jinhaagency1.com/ku/cand-u-huner/kifah-al-ghussein-bi-helbesten-xwe-bale-diksine-ser-jinen-filistini-39439

Çavkanî:JINHA



## [Bi hinceta 'dijberiya hîcabê' doz li jinan hat vekirin](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/bi-hinceta-dijberiya-hicabe-doz-li-jinan-hat-vekirin-39442)

Li gorî navenda ragihandinê ya Dezgeha Dadwerî, der barê Azade Semedî û Leyla Blokat bi hinceta "dijberiya hicaba bijarte" doz hatiye vekirin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/bi-hinceta-dijberiya-hicabe-doz-li-jinan-hat-vekirin-39442

Çavkanî:JINHA



## [‘Li Iraqê ji bo temsîliyeta wekhev pêdivî bi reformên lezgîn hene’]

Lêkolînera siyasî Ayat Muzafer Al-Nourî di qada siyasetê de astengiyên ku jin pê re rû bi rû dimînin anî ziman û bal kişand ku li hemberî vê û ji bo pêkanîna temsîliyeta wekhev a di qada siyasetê de pêdivî bi reformekê lezgîn heye.

https://jinhaagency1.com/ku/siyaset/li-iraqe-ji-bo-temsiliyeta-wekhev-pedivi-bi-reformen-lezgin-hene-39443

Çavkanî:JINHA



## [Li Îranê polîsê ku zarokek kuştibû, hat kuştin]

Polîsê ku dihat gotin ku zarokê bi navê Kian Pîrfalak di dema serhildana “Jin jiyan azadî” ya piştî qetilkirina Jîna Emînî ya ji aliyê ‘polîsên exlaqê’ ve li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê dest pê kiribû qetilkirin, ji aliyê xizmê zarok ve hat kuştin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-Irane-polise-ku-zarokek-kustibu-hat-kustin-39447

Çavkanî:JINHA



## Li Tirkiyeyê rêjeya bêkariyê ya jinan ji ya mêran zêdetir e

Li gorî îstatîstîkên hêza kar a meha Nîsanê ya Saziya Îstatîstîkê ya Tirkiyeyê (TUIK); di mêran de rêjeya bêkariyê bû ji sedî 8,1, di jinan de jî bû ji sedî 14,3.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-tirkiyeye-rejeya-bekariye-ya-jinan-ji-ya-meran-zedetir-e-39448

Çavkanî:JINHA



## Jina ku di bin traktorê de ma jiyana xwe ji dest da

ŞIRNEX - Li bajaroka Dêrgûlê jina ku li nav zeviyê dixebitî di bin traktorê de ma û jiyana xwe ji dest da.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/212776

Çavkanî:JINNEWS



# Şêniyên Seqizê dest bi grevê kirin

NAVENDA NÛÇEYAN - Piştî ku hêzên rejîma Îranê, bajarê Seqizê dorpêç kirin, xelkê Seqizê ji bo protestokirina rêya bi armanca çûnên ser gora Jîna Emînî asteng dike tê çêkirin, bi greva giştî protesto kirin.

http://jinnews41.xyz/kr/HEMU-NUCE/content/view/212760

Çavkanî: JINNEWS



# Jina 76 salî ku gotin miriye, di tabûtê de hişyar bû

Li Ekvadorê jina bi navê Bella Montoya 76 salî ku hatibû ragihandin li nexweşxaneyê jiyana xwe ji dest daye, di tabûtê de hişyar bû. Medyaya herêmî ji bo vê bûyerê got 'vejîn'.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jina-76-sali-ku-gotin-miriye-di-tabute-de-hisyar-bu-39469

Çavkanî:JINHA



## Camelia Sagadian a kurê wê hat qetilkirin rastî gefa kuştinê hat

Dayika Mihemed Hesen Turkmen ê ku di xwepêşandanên li Îranê de hat qetilkirin Camelia Sajjadian, ragihand ku ji aliyê kesên nasname wan nediyare ve rastî gefên kuştinê hatiye.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/camelia-sagadian-a-kure-we-hat-qetilkirin-rasti-gefa-kustine-hat-39466

Çavkanî:JINHA



## Hunermenda Mexrîbî: Divê jin xwe ji koletiyê rizgar bikin

Hunermend Samira Anwar bi riya hunerê hest û êşên jinan vedibêje, bang li hemû jinan kir ku ji koletiyê û hukmên derdorê rizgar bibin û wiha got: “Jin parçeyek bingehîn a civakê ye.”

jinhaagency1.com/ku/cand-u-huner/hunermenda-mexribi-dive-jin-xwe-ji-koletiye-rizgar-bikin-39460

Çavkanî:JINHA



## [‘Divê zagonên dadwer ji bo jinên Filistînî yên penaber hebin’](https://jinhaagency1.com/ku/hiq%C3%BBq/dive-zagonen-dadwer-ji-bo-jinen-filistini-yen-penaber-hebin-39456)

Seroka Yekîtiya Jinên Filistînê ya li Misirê Amal Said Al-Agha bal kişand ser rewşa penaberên jin ên Filistînî ku li Misirê dijîn û got “Divê li Misirê zagonên dadwer ji bo jinên Filistînî yên penaber hebin.”

https://jinhaagency1.com/ku/hiq%C3%BBq/dive-zagonen-dadwer-ji-bo-jinen-filistini-yen-penaber-hebin-39456

Çavkanî:JINHA



## ['Em ê xebatên xwe yên jinan xurtir bikin'](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/em-e-xebaten-xwe-yen-jinan-xurtir-bikin-39455)

Endama Meclîsa Jinan a Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Fîlîz Buluttekîn, der barê xebat û rêbazên ku piştî hilbijartinê bên meşandin axivî, diyar kir ku ew ê xebatên jinan xurtir bikin û wiha got: "Em ê di her qadê pêvajoyê de bi gel re bin.”

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/em-e-xebaten-xwe-yen-jinan-xurtir-bikin-39455

Çavkanî:JINHA



## Jinên Efgan: Talîban dê nikaribe pêşî li perwerdeya me bigre!,

Xwendekarên jin ên Efgan ên ku dibistana wan ji aliyê Talîbanê ve hat girtin gotin ku Talîban dê nikaribe rê li ber perwerdeya wan bigre, ew ê li malê bixwînin û perwerdeya xwe bidomînin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jinen-efgan-taliban-de-nikaribe-pesi-li-perwerdeya-me-bigre-39475

Çavkanî:JINHA



## 'Pêdiviya jinên Îskenderiyeyê bi ewlekariyê heye'

Damezrînera Însiyatîfa Ber Aman Mayar Mahmoud der barê maf û tundiya li ser jinên parêzgeha Îskenderiyê de nirxandin kir û got: "Tunebûna ewlekariyê parçeyek bingehîn a krîzên jinan e lewre jinek bi ewle bi ser dikeve û afrîner e."

https://jinhaagency1.com/ku/hiq%C3%BBq/pediviya-jinen-Iskenderiyeye-bi-ewlekariye-heye-39476

Çavkanî:JINHA



## Qanûna bi hejmara 6284’an a ku jinan ji tundiyê diparêze çima hedef tê girtin?

Piştî Peymana Stenbolê qanûna bi hejmara 6284'an jî ji aliyê tifaqên hikûmetê ve hedef tê nîşandan, jinan têkildarî mijarê diyar kirin ku ya ji bo desthilatdariyê esas ne mafê jiyanê ye pîrozbûna malbatê ye.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/qanuna-bi-hejmara-6284-an-a-ku-jinan-ji-tundiye-dipareze-cima-hedef-te-girtin-39477

Çavkanî:JINHA



## ‘Jinên ku xalîçeyan çedikin bi qasî keda ku didin mafê xwe nagirin’

Li Rojhilatê Kurdistanê çêkirina xalîçeyan, bi hezaran sal bi destên jinan heya roja me ya îro hatiye. Jinên ku bi çanda kevnar a bi hezaran salan bi hunera destên xwe didomînin bi vê pîşeyê debara xwe jî dikin lê bi qasî keda xwe ji mafên xwe bêpar in.

https://jinhaagency1.com/ku/cand-u-huner/jinen-ku-xaliceyan-cedikin-bi-qasi-keda-ku-didin-mafe-xwe-nagirin-39482

Çavkanî:JINHA



## Doza Mîraç Miroglu ku bi wesayîta zirxî hatîibû qetilkirin bi dawî dibe

Di doza Mîraç Miroglu ku "biqisûr" dibîne bi lêdana wesayîta zirxî hatî qetilkirin, xwest ku polîsê bercûs di asta herî jor de ceza bigre. Di danaşîna were de lê bendêne ku dozger mutalayê eşkere bike.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/doza-mirac-miroglu-ku-bi-wesayita-zirxi-hati-qetilkirin-bi-dawi-dibe-39488

Çavkanî:JINHA




## Berxwedana jinên Filistînî ya di bin dorpêç û êrîşan de hat vegotin

Jinên Filistînî, berxwedana jinên di bin dorpêç û êrîşan de vegotin. Nûnera Iraqê ya Meşa Jinan a Cîhanê Tayba Saad, diyar kir ku jinên Filistînî modela rol a têkoşînê ne.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/berxwedana-jinen-filistini-ya-di-bin-dorpec-u-erisan-de-hat-vegotin-39489

Çavkanî:JINHA



## Di pergala perwerdeya Tirkiyeyê de zayendperestî kûrtir bû

Di serdema desthilatdariya AKP'ê ya 21 salan de li Tirkiyeyê nijadperestî, olperestî û zayendperestiya di pergala perwerdeyê de kûrtir bû. Ji pirtûkên dersê bigre heta bernameya giştî hişê zarokan bi bîrdoziya zayendperest, serweriya mêr tê dagirtin

https://jinhaagency1.com/ku/dosya/di-pergala-perwerdeya-tirkiyeye-de-zayendperesti-kurtir-bu-39492

Çavkanî:JINHA



## Arwa Abu Rujaila bi ajokariyê qalibên civakî dişine

Jina Filîstînî Arwa Abu Rujaila li dijî kevneşopiyên civakê rawestiya, qalibên hişmendiya ku di pîşeyan de cudahî dixe navbera her du zayenda şikand û ji bo jinên li Şerîda Xezayê bû mînak.

https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/arwa-abu-rujaila-bi-ajokariye-qaliben-civaki-disine-39495

Çavkanî:JINHA



## [Ji Shirabadê li jiyanê niherîn: Jiyana dijwar a jinan û tabûya regle](https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/ji-shirabade-li-jiyane-niherin-jiyana-dijwar-a-jinan-u-tabuya-regle-39496)

Herêma Shirabad a Îranê yek ji herêmên xizan e ku gelek koçber lê dijîn. Zarokên keç ên ku rastî cudakariya zayendî tên, ji ber tirsa reglbûyin e û nebûna malzemeyên hîjyenê, perwerdeya xwe nîvço dihêlin.

https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/ji-shirabade-li-jiyane-niherin-jiyana-dijwar-a-jinan-u-tabuya-regle-39496

Çavkanî:JINHA



## [‘Zagonên herêma Başûrê Kurdistastanê parastina kiryaran dike’](https://jinhaagency1.com/ku/hiq%C3%BBq/zagonen-herema-basure-kurdistastane-parastina-kiryaran-dike-39497)

Endama Yekitiya Jinan Zara Elî dibêje ku zagonên herêma Başûrê Kurdistanê pişta mêran digrin û jin ji mafên xwe bêpar tên hiştin.

https://jinhaagency1.com/ku/hiq%C3%BBq/zagonen-herema-basure-kurdistastane-parastina-kiryaran-dike-39497

Çavkanî:JINHA



# [Jinên beşdarî komxebatê bûn: Çareserî projeya netewa demokratîk e](https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jin-li-ser-rojhilata-navin-niqas-kirin-Careseri-projeya-neteweya-demokratik-e-39505)

Jinên ku di komxebata “Bi hev re ji bo Rojhilata Navîn a demokratîk riya ber bi aştiyê ve” ya li Beyrûd paytexta Libnanê hat lidarxistin de axivîn diyar kirin ku kilîda çareseriya qeyrana Rojhilata Navîn Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan e.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/jin-li-ser-rojhilata-navin-niqas-kirin-Careseri-projeya-neteweya-demokratik-e-39505

Çavkanî:JINHA



**Nûçeyên herêmî**

## [Li Idlibê mafê kurtajê nayê nasîn: Jiyana jinan di xeteriyê de ye]

Li Îdliba ku di bin dorpeça HTŞ'ê de ye, jinên ku nikarin xwe bigihînin mafê kurtajê ya bitendurist, hewl didin ducaniyên xwe yên naxwazin bi rêbazên ku jiyana wan dixe xetereyê de bi dawî bikin.

https://jinhaagency1.com/ku/tenduristi/li-idlibe-mafe-kurtaje-naye-nasin-jiyana-jinan-di-xeteriye-de-ye-39420

Çavkanî:JINHA



## Yek ji jinên şoreşê Gulîstan Elî: Şoreşa Jinê bû nimûne

Endama Desteya Rêveber a Daîreya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser Gulistan Elî ya yek ji pêşengên Şoreşa Jinê ya Bakûr û Rojhilatê Sûriyeyê ye behsa beşdarbûna xwe ya şoreşê kir.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/yek-ji-jinen-sorese-gulistan-eli-Soresa-jine-bu-nimune-39436

Çavkanî:JINHA



# Li Efrînê jinek hat qetilkirin

Li Efrînê ya di bin dagirkeriya dewleta Tirk û çeteyên girêdayî wî de ye, jinek 40 salî hat qetilkirin.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-efrine-jinek-hat-qetilkirin-39451

Çavkanî:JINHA



# Serpêhatiyek 105 salan: Rîstinê fêrî nifşên li pey xwe dike

Xezal El-Mutleq a 105 salî çanda herî ristîne ku ji dayik û mezinên xwe fêr bûye hînî 8 nîfşên li pey xwe kir. Xezal El-Mutleq bi gotina “Civaka ku dîroka wan nebe pêşeroja wan jî dê nebe” banga xwedî derketina li dîrokê dike.

https://jinhaagency1.com/ku/civak-jiyan/serpehatiyek-105-salan-ristine-feri-nifsen-li-pey-xwe-dike-39474

Çavkanî:JINHA



# Li Efrînê polîtîkayên qirkirinê

Endama Koordînasyona Kongra Star Efrîn-Şehbayê Rîhan Elo li ser polîtîkayên qirkirinê yên li herêmên dagirkirî tê meşandin axivî û got ku hedefgirtina jinan polîtîkayên qirkirinê nîşan dide.

https://jinhaagency1.com/ku/rojane/li-efrine-politikayen-qirkirine-39490

Çavkanî:JINHA



# Hejmara 3’emîn Kovara Silava derket

Yekîtiya Jinên Ciwan di çarçoveya xebatên xwe de 3’emin hejmara kovara Silava bi manşeta "Bi Rihê Zîlanan Şoreşa Jin Biparêzin Azadî Serbixînin” derket.

https://jinhaagency1.com/ku/cand-u-huner/hejmara-3-emin-kovara-silava-derket-39494

Çavkanî:JINHA



**Kongra star**

**17/6/2023**